

# Nivîskarên Paşerojê



## Cejna Bûna Kepir

**Huner Berwari**  
**13 sal navinciya aştî**

Hat cejna bûna te ye  
Dilê me li ser te ye  
Navek jêhatî û berêz  
Evro hejî te ye  
\*\*\*

Jêderê pêzanîna  
Me bi te serkeftin îna  
Şiyanê xwe dimezêxî  
Me dike zîrek û zana  
\*\*\*

Dê te danîn ser desta  
Bi te derbirîn hesta  
Dê pêdaçûn û bix-  
wînin  
Wan çîrok û helbesta

## Newruz û azadî ye

**Hêvî ahsan bidalle**

Keyfî û xweş û şadî ye  
Cejna serfirazî ye  
Serê sala kurdî ye  
Newroz û bihara nû

Mêrg û çîmen xemilî  
Keç û kurên welatî  
Pîrozkirin roja nû

Newroze nema zurî  
Hemû xelkê kir şahî  
Werin bikin hevkarî  
Da ava bikin vî warî

Newroz û Kurdistan e  
Ew beheştê cîhane  
Hêvî û xasta dilan e  
Lê bilind bikin alane

## Harîkari

**Vehîn Hemîd Bavî**



Rojekê ji rojan mêriyekê dendikeka genimî dît, îna ewê xwazit û bizav kir ewê dendika genimî bibe di kûna xwe ve. Belê hindî hatê neşiya bibe di kûna xwe ve û hindî hizra xwe kir ku çar-eyekê ji bo vê arîşê bibîne, belê çî çareserî nedîtin, li dûmahikê hizîrekê xwe li serîda wîlîvîvî, îna gazî hevalên xwe kir û gote: Werin da em hemû li gelîyek vê dendika genimî bibin di kûna xwe ve, hevalên wê jî hatin û hemûya pêk ve dendika genimî bire di kûna xwe ve, û paşî hemûya bihevra xwar û wesa hemûya pêk ve harîkariya yek û dû kir û hevkarîya wan mîfa da û sergirt, îna hemûya pêk ve soz da, ku êdî ji niha pêve hemû bihev re berdewam dê di harîkarin di gel yekûdû, da karubarên wan birengêkê rast û dirust birêve biçin, hîç asteng ne kevne di rêka wan de, wekî bab û bapîrên me gofî:

(Ddestekê bi tenê deng jê nahê)





## Newroz

Ev helbeste diyarî bu rûpelên kepira zêrîn

**Araz Ewnî**

Mizgînî ye mizgînî ye  
 Evro û rojeka nû ye  
 Ewî newroze  
 Cejnaka zur zur pîruze  
 Cejna kurdan e  
 Ya xort û egîdan e  
 Divê nû rojê de  
 Kesek rabû ji me kurda  
 Navê wî Kaweyê asinger  
 Te kuçê xwe îna der  
 Serê zuhakî kir e dûker  
 Kurd ji bin zulmê anîne der

## Kurdistan

Kurdistan navekê zêrîn e  
 Kurdistan peyveka ciwan e  
 Lewra dibêjin Kurdistan  
 Kurdistan cihê bab û  
 bapîran e  
 Kurdistan welatê me hemû  
 kurdan e  
 Şiruda me siruda (ey reqîb)  
 e  
 Dîlî Kurdistanê kerkûk e  
 Paytextê Kurdistanê hewlêr  
 e  
 Şarê Kurdistanê Duhok e  
 Her dibêjin bi ji kurd bi ji Kurd-  
 istan



**Rêbaz heval**

## Neame

**Mesud mihimdamin alcibar**

Lezatiya nelamê 64km di demjîmêrekê de,  
 neame heta 30 salan diji, neame li dût beza xwe  
 dişê berî hêştirê raket, neame di çaryekê de  
 dişê heta (7) lêtirên avê vexwe, her pêngaveka  
 nelamê digehe 4 , 5m, dirêjiya stûyê wê digehe  
 mêtrekê, giraniya mejiyê wê 40gim an ku  
 xwedana biçûktirîn mejî ye di nav gyaneweran  
 de.

Çavê wê ji mejiyê wê mezintir e, hêka nelamê  
 pêdivî bi 100 deqîqaye heta dihê kelandin, têtjika  
 wê dişê yekser birêve biçê demê hêkê derikeve,  
 nelame gyanewerekê bi tenê ye ku pîstê wê dihê  
 bûyax kirin.

## Çend pêzanin li ser pişik

**Biner Hesên  
11 sal duhuk**

Pişik mişka naxwet xwe eger gelek  
 ya birsî be. Heta têt yariya pê  
 neke.

Pişik Melevaniya dizane. Belê hez ji  
 avê nake. Pişik hez dike bi şevî  
 bimîne di jorve çimkî ewî demî wî  
 zû sar dibê.

Pişik gelek zû hest bi tîştê dike û ji  
 ber hindî xwe ji metirsiya dur dike.  
 Xwe heger ya nivîstî be.